


Danasîn bi romana
"Serhatiyên Rustem û namerdiya
namerdan"

Ya nivîskarê Kurd ê hêja: **Riza Çolpanê**

Amedekirina:
Rêberê Silfî

Riza Çolpan, Kurdekê
Dêrsimî, bi rêola xwe jî
(elewî) ye. Ew li sala
1936an, li gundekî ji
gundên bakurê
Kurdistanê, hêla
Dêrsimê ji diya xwe



bûye, 5 salan dibistan xwendiyê û sala
1951ê, ji ber tengasiya rewşa malbata
xwe ya aborî, berê xwe dide EDENê û
paşê jî STENBOLê. Ew li wir dixebite û
diravan ji malbata xwe ya perîşan re
dişîne. Piştî sê salan leşkeriya dewleta
Tirk dike, îca berê xwe dide girava
QIBRISê û li wir dibe xwedî jin, zar û
zêç. Sala 1962an, careke din vedigere
STENBOLê û sala 1970î koçber dibe û li
Australyayê cîwar dibe, nasnameya wî
welatî hildigire û ta vê gavê li wir dijî.

Roman ji 560 rûpelên pîvana orte pêk hatîye, ji weşanên VENGê ye. Çapa yekemîn, di Tîrmeha sala 2004an de derketiye. Ew bi zimanekî xweş î lihevhatî, hestekî nazik û zîrekiyeke wêjeyî hatîye nivîsandin. Lehengê romanê, Rustemê Kurd, jiyana û kesayetiya romanivîs bi xwe nîşan dide, herweha roman rewş, pergala û jiyana gelê Kurd li bakurê Kurdistanê ya wê qonaxê nîgar dike. Zimanzan û folklornasê Kurd Pirofêsor birêz Celîlê Celîl, bi pênuşa xwe ya zêrîn û zimanê xwe yê şêrîn pêşgotineke bedew jê re nivîsandiye.

Naveroka Romanê bi kurtasî:

Rustem, xortê Kurd ê nûhatî, ji ber rewşa malê, ji ber xizaniyê, sitemkariya zirdebirayê xwe ji gund direve, diya xwe ya bî û çend zarokên biçûk li şûn xwe dihêle û bi mebesta peydakirina karekî, berê xwe dide

bajarê mezin STENBOLê. Rustem, li durv û jiyana xelkên wî bajarî matmayî dimîne. Cudahiyeye mezin di navbera jiyana gund û wî bajarî de dibîne, çawa ku elektrîkên rengîn bajêr dixemilînin, jinên servekirî û çaqrût bi tena serê xwe di kolanan de diçin û tên, deryaya mezin bajêr dorpêç dike, li hawîr dengê motorê keştiyên deryayê belav dibe... Li wir, gelek heval, hogir, gundî û nasên xwe dibîne, ew rebenên ku karên herî giran û gemar dikirin!!...Ji neçarî, ji bo peydakirina nanê rojê, li kêleka wan dost û hevalan, Rustem jî dest bi karê barkêşiyê dike, li cihê serjêkirina dewaran, di nav rêx û pîsîtiyê de dixebite, geh xwe birîn dike, geh di bin baran dikeve, lê divê ew xwe hînî vê jiyana nû bike !!.

Bextê Rustem ê reş û qidoşê wî yê mirî jiyana wî li welatê xerîbiyê jî reş dike, dilê wê yê mişt bi eşq û evîna mirov û mirovatîyê kul dike û derd û bela jê re peyda dibin. Geh ewê nexweş bikeve, yan wê bête girtin û zindankirin, ji karê xwe bimîne, paşê karê wî ji dest dice. Vêca bi rojan li kolanan digere ta ku karekî din ji xwe re bibîne. Di bêkariya xwe de, ew dibe mêvanekî rojane ya çayxana Mistoyê Xilxolî ya ku heroj dost û hevalên wî tede çayê vedixwarin û sikembîlan dilîztin, ew jî tevlî wî kerwanê bê karan dibe.

Pismamekî wî û zavayê wî jê re karekî li karxana şerabê dibînin, bi kêf û şanazî karê xwe yê nû dike, zû fêr dibe û berpîrsên karxanê jê hez dikin. Rewşa wî baş dibe dilê wî bi jiyaneke xweş dibe, ji keçeka hevala xwe ya karxanê a bi navê (Ayten) ji dil û can hez dike, herweha keç jî pir jê hez dike, soz û peymanê zewacê bi hev re didin, lê feleka reş rê li ber evîna wan digre û nahêle ew evîn here serî ji ber ku ji nişka ve Rustem li kolaneke tê girtin û 4-5 mehan di girtîxanê de dimîne. Piştî ku ew ji girtîxanê direve, **D.R. (9)**